



Cejina Derbazbînê

Piştî pêxember Yusiv mir, bu 400 sala Îsraîliya xulam li welatê Misrê bîn. Piştî hingê Xwidê pêxember Musa rakir da Îsraîliya ji destê Misrê u ji xulamatiê wan xilas bit.



Xwidê li gel Musa axift li Çâyê Hûrîbî bi bizotekê agirî yê ne sutîe u gut, “Ez Xudayê babê te u Îbrahîmî u Îshâqî u Ye’qubî me.” Wê gavê Musaî ji tirsê xu veşart ku Xwidê ne bînit.



U Xudanî gut, “Min rezîlî ya milletê xu li Misrê dît u min guh li qîjî ya wan bî ji ber dil reqî ya wan kesê ew bin dest kirîn u min nexuşîa wan zanî. U ez hatime xwar da ku wan ji destê Misrîya qurtal bikim, wan ji wî erdî bu erdekê xuş u fireh. Dê rabe vê gavê da ez te bihinêrim def fir’ewnî u tu milletê min Îsraîlî ji Misrê der êxî.”

U Xwidê gut, “Xwidê ye <Ez im yê her ez> u herwesa gut, <Husa dê bêji Îsraîlîa, <Ez im ewê herher> ewe yê ku ez bu we hinartîm>. U dîsa gute Musaî, “Husa dê bêji milletî Îsraîlî, “Ew Xudanê <herhey> Xudayê babê te Xudayê Îbrahîmî u Îshâqî u Ye’qubî ez yê hinartîme def we eve ye navê min bu heta hetayê u ew nave ye yê ku ji serdem bu serdemî bêjine min. Te dê çine def paşayê Misrê u bêjê, “Xudan, Xudayê ‘Îbranîa serameda bihêle em qurbana sê roja li berîê biçîn u em gurîya bu Xudanî Xudayê me bidîn.” U belê ez dizanim paşayê Misrê we naberdit heta ku destekê bi hêz wî neçar nekit. Ez dê destê xu drêj kim u dê bi hemî nîşanê seyr yê ku ez têda çêkim danime Misrê u piştî hingê dê we berdit.”

Xudanî gute Musaî, “Min tu bu Fir’ewnî weku xudanekî lê kirî, u Harunê birayê te dê weku pêxemberekî bu te lê êt. Ya li ser te ewe heçî fermana ez bidime te tu bêjî, u birayê te Harun li gel Fir’ewnî dê axivî da Îsraîliya ji welatê xu der bêxit, belê ez dê dilê Fir’ewnî req kim u dê li erdê Misrê nîşanê xu u tiştê seyr zêde kim. Belê Fir’ewn guh nadite we. Li wî demî da dê bi hêzeka mukim u mezin u dadkîrî dijwar danime Misrê u milletê xu ji Misrê der êxim. Demê ez didanime Misrê u Îsraîliya ji nav beyna wan derbêxim hingê Misrî dê zanin ku ez im Xudan.”

U ka çawa Xudanî ferman da wesa Musaî u Harunî bi diristî kirin. Ji yê Musaî di heştê da bî u yê Harunî u di heştê u sê da bî demê digel Fir’ewnî axiftin.

Neh cara Fir’ewnî qebîl ne kirî xastinê Musaî u Harunî da Îsraîliya ji Misrê bînin derê. Her car Fir’ewnî qebîlnekirî, Xwidê belayê xirab li ser Misrê u Misrîa virêkirin. Eve he belayê wan bîn:

(1) Rîbarê Nîl xwîn bî. Masî mirin u rîbar genî bir u Misrî neşîa avê ji Rîbarê Nîlê vexwin. Xwîn jî li tankîet avê u bera bîn. U hemî Misrîya li durê rîbarî çal kulan bu ava vexwarnê çunku ne şîan ava rîbarî vexwin.

(2) Piştî hingê Rîbarê Nîlê tijî ji beqa serda çû, u li ser hemî edrê Misrê li her cih dagirtin – li mala u cihê nivistina miruwa, li ser texta, di fîrna da, u li cihê xwarnê bîn. Piştî Musa nivêja kir, beq li mala u xanîa u çema ne man. U Misrîa gelek kum ji beqa çêkirin u heta erd ji wan genî bî.

(3) Belayê sê pêşula bî. Pêşula li ser xelkê u pêrrha belav bîn axa erdê Misrê bî pêşula.

(4) U piştî hingê Xwidê revdê mêşa virêkirin li hemî erdê Misrê. U mêşa erd pîç kir. Belê li cihê Îsraîliya mêş ne bîn. U Musa ji Fir’ewnî sîal u nivêj bu Xudanî kir u Xudanî nivêja Musaî qebîl kir,

vêca mêş ji Fir'ewnî u desteka wî u milletê wî rabîn u bi xu mêşek bi tinê ne ma. Belê Fir'ewnî careka dî dilê xu req kir u millet ne berda.

(5) *Belayê pêncê eve bî: mirin ji nesaxîa xirabê ji hemî hespa u kerra u hêştira u garana yê Misrîa. Belê, ji yê Îsrailîya nesax ne bîn u ne mirin jiber parastinê Xwidê.*

(6) *Belayê şeşê eve bî: kulik li ser her dû miruva u gîanewera.*

(7) *Belayê heftê babelîskê xirab bî.* Xudanî gurrura 'ewira u gijluk hinartin. U birîsîya li erdê da. U Xudanî gujluk li ser hemî erdê Misrê barand. U gujluk barî u birîsî li gel gujlukê têkil bîn. U pîstirîn hurr bî Misrê dîtî hindî xuzanî millete. U gijlukê li hemî erdê Misrê kir u zîan gehande çî tiştê li cema ji miruv u pêrha. U her gîayekê şîn li çemî pîç kir u hemî dar şikandin. Belê erdê Casan yê ku Îsrailî lê dijîan, bi tinê gujluk lê ne barî. U husa dilê Fir'ewnî req bî. U Îsrailî ber ne dan bi dirustî weku Xudanî li ser zimanê Musaî gutî.

(8) *Belayê heştê kulî bî.* Hemî rîê erdê nixaft heta ku tarî kirî. U her çî gîlîê li ser xwar u hemî fêqîê dara yê jiber gujlukê maîn xwarin. Vêca çî tiştê kesik ne li ser dara u ne li çema li hemî erdê Misrê ne ma.

(9) *Belayê nehê tarîyeka til çav bî.* Çaxê sê roja tarîyeka til çav hemî erdê Misrê nixaft. U kesê ne dişîa birayê xu bibînit. U kes çaxê sê

roja ji mala xu der ne ket. Belê runahî li erdê Îsrailî lê heyn hebî.

(10) *Belayê dehê eve bî: mirnê zelum u kurr u gîanewer yê nexirî li mala xu.*

U Xudanî gute Musaî, "Êk bela ya maî. Ez dê bi serê Fir'ewnî u Misrîya înim u piştî hingê dê we ji vîrê der êxit."

U Musaî gut miruva, "Ev çende ye Xudan dîar dîkit: <Ez dê li durêt nîva şevê kevîm nav Misrê. U her nexirîek têda dê mîrit. Her ji nexirîê Fir'ewnî yê li ser textê paşayê bigire u heta nexirîê carî ya li ber distarî. U her wesa nexirîê her gîanewerekê. U dê gazîeka bilind bi ser hemî erdê Misrê kevîtin u çî cara weku wê rî ne daîe u rî naditin. Belê dinavbera Îsrailîya da çî se narrewne çî miruv u gîanewera. U hingê dê bu we dîarîyê ku Xudan cîawazîê dinavbera Îsrailîya u Misrîya da dîkit. U paşî hemî ev kuîlê te dê êne def min u li def min xu çemînin u bêjin, <Tu u heçîê ji milletî bikevit dîv te derkevin. U hingê bi tinê ez dê çim. U paşî bi kîneka mezin ji dev Fir'ewnî çû.>"

U Xudanî gute Musaî, "Fir'ewn qebîl nakit guhê xu bidite we, daku nîşanê min li erdê Misrê zêde bin."

U Musaî u Harunî ev hemî nîşane li pêş çavê Fir'ewnî kirin, belê Xudanî dilê Fir'ewnî req kir. U Îsrailî ji erdê Misrê der ne êxistin u ber ne dan.

Pêtivî ya Derbazbînê

U Xudanî li gel Musaî u Harunî li erdê Misrê axift u gut, "Ji evru pêve ev heyva henê dê bu we bîtin serê heyva, u êkemîn heyvê malê. Bêjine hemî civata Îsrailê, <Li ser her kesekê yafere li dehê vê heyvê kavirekê bu mala xu bînit. Bi gureî malê baba, kavirek bu her malekê. U divêt kavir nêr bit u jîê wî malek bit u çî kêmatî lê ne bin, ji ber xa yan bizina helbijêrin. U dê li def we helgirtî bit heta roja çardê ji vê heyvê. U paşî hemî gelê Îsrailê dê bi karê vekuştina kavira li êvarî rabin.



U dê xwîne înin u danine ser her dûmelbena u serdera wan malê têda dixwin. U paşî her li wê şevê guştê biraştî li gel nanê şikeva li gel gîayê texil bixwin. U wî guştî nexav u nekelandî ne xwin. Belê bila bi agirî bi raştî bit u bi serupê u rîvîkê wî u tiştê di zîkî da bixwin. U çî yê ne hêlin bu spêdê. Belê heçîê maî heta spêdê bi agirî bisujin. U husa bixwin. U şûitka we girêdaî bit u kalkê we li pê wê bin u darê we di destê we da bit. U bi lez u bez bixwin u eve dê bu Xudanî derbazbîn bit.

U li vê şevê ez dê kevîm nav welatê Misrê u dê her nexirîekê ji

miruv u gîanewera kujim u hemî xudayêt Misrîya dadkim. Ez im Xudan. Belê hîn – ew xwîna li ser xanîêt we yêt ku hîn têda – dê bite nîşanek we cida bikit. U ez dê xwînê bînim u ji we derbaz bim. U wêrankirna ez bi serê Misrê bînim, bi ser we da naînim.

U ev roje dê bu we bite bîrhatin u bu Xudanî ahingê bi wê rojê bikin – ferzeka heruher. Li hemî serdemêt xu dê ahingê pê kin.”

U paşî Musaî gazi hemî rihspîêt Îsrailê kir u gute wan, “Herin u kavira bi gureî malêt xu helbijêrin u kavirê derbazbînê vekujin. U paşî qeftoka gîayê zufa bînin u di xwîna li nav amanî parizîni hilînin u serdera xu u her dûmelbena pê bihinîn. U kesek heta spêdê ji mala xu der ne kevit. Çunku Xudan dê bi şevê burit daku Misrîya wêran bikit u demê xwînê li ser derê u her dûmelbena dibînit, dê ji derrgehî burit, u nahêlit yê xelkê wêran bikit bête di xanîêt we da u li we bidit. U hîn u biçikêt we weku feriz bu heruher dê bi vî karî rabin. U demê hîn diçin dinav wî erdî da yê ku Xudanî suz daî bidite we, hîn dê vê ferzê kin. U demê biçikêt we pisîarê ji we dikan, Ramana vê ferizê bu we çi ye? Hingê dê bersiva wan din – eve gurîê derbazbîna Xudanî ye – yê ku demê Misrî wêran kirîn ji malêt Îsrailîya derbazbî wî, u malêt me qurtal kirin.” Îna milletî serêt xu nizimî erdê kirin u çûne sucdê. U Îsrailî çûn, ka çawa Xudanî fermana Musaî u Harunî kirî, bê kêmatî bi cih înan.

Lêdana dehê: Mirna Nexirîya



U di nîva şevê da Xudanî hemî nexirîet welatê Misrê wêran kirin, her ji nexirîet Fir'ewnî yê li ser textê paşatîê bigire u heta nexirîet miruvê zîndan kirî, u her wesa nexirîet hemî gîanewera jî.

U Fir'ewn u desteka wî hemî Misrî bi şevê ji xew rabîn u hewareka mezin yê li erdê Misrê ye çunku çi mal ne bîn kes jê ne mirî. Fir'ewnî bi şevê gazi kire Musaî u Harunî gute wan, “Rabin u ji nav milletî derkevin, hîn u Îsrailî, u weku we xwastî Xudanî perêsin. U weku we daxaz kirî, pez u çêlêt xu li gel xu bibin u herrin, u min jî pîruz bikin.”

U Îsrailê ji Re'emsîsê barkirin u çûne Sukkutê u jimara wan 600,000 zelumêt peya bîn ji bilî jin u biçîka. U herwesa jimareka mezin ji xelkê gehîştine wan li gel pez u kewal u gelek kerêt terşî. U paşî weku durka ew hevîrê ji Misrê

li gel xu înaîn pextin çunku ne tîrş kirî bî, çunku ji Misrê hatin der êxistin u ne şîan xu gîr u bikin u çi xwarin amade ne kirin.

Cejina Nanê Şikeva

U Xudanî gute Musaî, “Her nexirîekî nêr bu min dane. Heçê cara êkê ji şerma deyka xu derkevît ji Îsrailîya – bu min e – ew nexirîet ji miruva bit yan ji gîanewera bit.”

U Musaî gute milletî, “Wê roja hîn ji Misrê – welatê kuîlatîê der ketin bînine bîra xu – Xwidê hîn ji wêrê bi destekî bi şîan ber dan. Vêca nanê tîrşkirî ne xwin.

Demê rojê da hatî kurrêt te pisîarê ji te dikan, <Ramana vê çi ye?> Tu bersiva wî bide: <Xudanî bi destekî bi hêz u şîan em ji welatê kuîlatîê der êxistin. U demê Fir'ewnî xu hişik kirî u qebîl ne kirî me ber dit, Xudanî her nexirîek li welatê Misrê wêran kir. Ji nexirîet miruv u gîanewera. Ji ber wê çendê ez her nexirîekî şerma deyka wî cara êkî pê hatî vekirin pêşkêşî xudanî dikim. U her nexirîek ji biçikêt xu serekî pêş ve didim daku bi şev u roj bişên li ser bi rê ve biçin. U ev ferza henê dê weku nîşanekî li ser destê te bit u di rîşmek dinavbera herdû çavêt te bit, çunku Xudanî bi destekî bi hêz u şîan em ji Misrê der êxistin.”

- Pirtuka Musaî ya Dûe ya Derketin 3:6-8, 10, 14-15, 18-20; 7:1-7, 24; 8:14, 17, 31-32; 9:10, 23-24-26, 35; 10:15, 22-23; 11:1, 4-10; 12:1-3, 5-14, 21-32, 37-39; 13:1-3, 14-16